# Dîyarîya Newrozê



Şîlan Doskî
dayka_kurd@yahoo.com

Roja mina nî, mino vî warî
Adara rengîn, mino vî halî
Goldanka min bê gul û nêrgiz
Bêy te ma xalî li cejna arî

Xwena min û te, agirê pîroz
Hilkeyn ez û tu li cejna newroz
Li ser çîyaya bi yek dil û can
Seyran û şehyan, hozan û awaz

Bigrîn ez û tu li dora agir
Govenda kurdî destê al ragir
Vedeyn tilîlî, hejînîn milî
Dûr keyn ji warî zilma dildagir

Roja mina nî, lê min bû tarî
Xwen û xeyala dil li min xwarî
Li warê xerîb herdem bîyanî
Çûna berev war, bike dîyarî

# دیاری یا نەورۆزێ

رۆژا منا نی، منۆ ڤی واری
ئادارا رەنگین، منۆ ڤی حالی
گۆلدانکا من بێ گول و نێرگز
بێی تە ما خالی ل جەژنا ئاری

خەونا من و تە، ئاگرێ پیرۆز
هلکەین ئەز وتو ل جەژنا نەورۆز
ل سەر چیایا ب یەك دڵ و جان
سەیران وشەهیان، هۆزان وئاواز

بگرین ئەز و تو ل دۆرا ئاگر
گۆڤەندا کوردی دەستێ ئال راگر
ڤەدەین تلیلی، هەژینین ملی
دوور کەین ژ واری زلما دڵداگر

رۆژا منا نی، لێ من بوو تاری
خەون و خەیالا دڵ ل من خواری
ل وارێ غەریب هەردەم بیانی
چوونا بەرەڤ وار، بکە دیاری